MEDENÎ FERHO

# HEY GERÎLLA



ABeCe // helbest

medeni ferho

# HEY GERÎLLA

weşanên ABeCe
ABeCe yayınları

weşanên ABeCe : 4
hejmar : 4

Çap 1994
Adres : Brusselsesteenweg, 638
1731 Zellik (Asse)
BELCIKA

Pergala berg û rûpelan: ABeCe

D/1993/6605/4

MEDENI FERHO

# hey gerîlla

helbest

## Pirtûkên medeni ferho

| | |
|---|---|
| Toprağın Türküsü | -helbest/bi Tirkî |
| Kaytan Osman | -çîrok/bi Tirkî |
| Mapusluk Gerçeğim | -helbest/bi Tirkî |
| Hades Iş Başında (Yaşam Tutsak Ben Tutsak) | -romana girtin û perçiqandinê/bi Tirkî |
| Beranê Kozî | -çîroka dirêj/bi Kurdî |
| Hey Gerîlla | -helbest/bi Kurdî |
| Berxwedan Jiyan e | -mîtolojîk/bi Kurdî |
| Mîrza Mihema | -mesele/bi Kurdî |

bo bîranîna
wan xweşmêrên
li serê çiyayên Kurdistanê
bi xwîna xwe
û wan xweşjinên li
kolanê welatê biyanî
bi agirê li ser bedena xwe
helbestên herî mezin
di nivîsin

Min kir û nekir, ji nava
mêjiyê min, germ û şewata
azadiyê der neket. Ber ku
tovê azadiyê jiyan e.
Hiseynê FERHO

# pêşgotin

Birayê delal Medeni FERHO, rojekî helbestên xwe hilda û hate cem min, hezdikir ku pêşgotina pirtûka wî ez bi nivîsim: Ez gelekî kêfxweş bûm. Car carna kalikî û pîrîtiya mirov jî xweş e. Gelek heval û rêheval qedrê rûsipiyên xwe digirin û wana datîne cîyê pîsporan. Lê belê ev jiyaneke xweş e. Êdî ez bawerim ku ez jî rûsipî me. Heval, min wisa dibînîn.

Min bi helbasta çavên xwe vekir, Hinek Tirkî bûn, hinek jî Kurdî. Helbest bîna gula ne, dengê jiyanê ye, dengê şoreşê ye, evîna dilan e!... Di edebîyata hemû gelî de ciyekî helbestan ciyekî bilind e.

*Agir bi Kurdistanê ket*
*Li wira dikê hawara dil*
*Li bax û bostana ket*
*Maye du bulbul jê rû dil*

Dûr û nêzîk meriv dikarê bêjê ku ew welatparêzê hêja, îro agirê bi Kurdistanê ketiye di wan rojên tarî de dîtibû.

**Seydayê Cigerxwîn** dibêjê:

*Navdare welatê te hemî merkezê ceng e!*
*Herkes bi me zanî bi xwe Kurd şêr û piling e*
*Hawîr xwe temaşeke binêr gazî û deng e*
*Hey hey qehreman milletê Kurd rabe dereng e!.*

Di van rojê tarî de, li Kurdistanê helbestvanê ku dengê welatparêziyê bi helbestan bilind kirine, wana welatparêzî û jiyana gel çî ye, hînî me kirine. gelek şaîrên Kurda îro ji bo me bû ne dîroka welatparêziyê û jiyanê. Hêvîyên gelê Kurda jî, ji şaîrên hemdemî jî hewqasî zêde hene. Ji seydayê mezin **Ahmedê Xanî** de heya vê gavê. Gelê Kurd hêvîyên pir mezin ji şaîrên hemdemî dikê. Ber ku, helbesta me jiyana me ye. car cara **Memê Alan e, Xacê û Siyabend e, Mem û Zîn e, Evdalê Zeynikê ye, Derwêşê Evdî ye, Felîtê Quto ye, Keliha Diyarbekr a xopan e, Gola Wanê ye, Çiyayê Sîpana Xelatê ye, Deşta Rewanê ye, Desmaleke sorgevez e!...** Car cara jî, **Şêx Mehmûdê Berzencî ye!...** Li Mehabatê bi rûwê xwe yên sipî **Qazî Mihemed e, Şêx Seîdê kal e, Elî Şêr e,** li dêrsimê **Seyît Rıza ye!...** Li ser sê pê azadî û xelasbûna Kurdistanê ye. Hêstirê çavên bûkan e!... Zîndan e!... Dadgeh e!... Xwîna şehîdan e!... **Kawa ye, Kemal Pîr e, Mazlum Doğan e!...** Li çiyayê Kurdistanê şoreşger in!... Kûlîlk e!... Berf e!... Bager e!... Berfîn e!... Bahar e!... Gul û sosin e!... Zozan e!... Her tim jiyan e!... Berxwedan e!... Rabûna ser pîyan e!... Şer e!... Têkoşîn e, rizgariya xelasbûnê ye!... Li çiyayên me mij û moran e!... Kendal e!... Mirin û mayina xortan e!... Morî û mircan e, di gerdena bûkan e!... Bazinekî zêr e, xemla bûkan e!... Belê helbest Kurdistan e!...

Helbestên Kurda îro, **Botan e, Amed e,** serhildan e!...

Li aliyê **Elegêzê, Kupqiranê,** li **Bazidê** şerê mêrxasan e!... Keçê Kurda ne, gerîlla ye!... Gerilla yên Kurda ne!... Çiya yên me ne!... Serhed e!... Serbilind e!... Eşqa dilê min e!... Dicle û ferat e!... Ya **Ahmedê Xanî** ye, **Melayê Cizîrî** ye!... Serxwebûn e!... Berxwedan e!... Sed **Mem û Zîn e**!... Ronekbîrî zor û zehmet e. Ji bo Kurda, li ser reya wan mirin heye, zîndan heye. Rewşenbîrên Kurda bi lingekî li mirinê, bi lingekî li mayinê ne. Welat li pîyan e, ceng e, şer e, agirê jiyana me di nav wî agirê şoreşê de bi dengekî, bi şewtekî, bi rêçekî, bi çirîskekî, em tune bin nabê.

Agirê azadî û serbestiyê bi çiya ketiye. Zêwî, gelî û zozan tev di şuxulin. Şewqê daye dilê xort û qîzan. Kî dikarê di roja îro de vî agirî ne bînê? Salên zor û zehmet ji par re man, em niha li ber çemê ronahî û serxwebûnê ne. Seydayê mezin **Melayê Cizîrî** na bêjê?

*"Em Dîcle û Ferat in lê feyza me weke Nîl e"*

Li ber gelek seyda û zanayên Kurda yên gorbehişt, ez dikarim bêjim, hûn bê xem razin, agirê azadî û serbestiyê ji Suphanê, ji Tandurekê heya Mehabatê, heya Silêmaniyê, heya Urmiyê bigirin heya çiyayê Şengalê dişuxilin: **Ya azadî ya mirin!...**

Yaşar KAYA

20. 08 1994 Bruksel

## tu li ku mayî

Çima deng ji te nayê
Çima deng ji te nayê
Mêrî çê yî xwendevan
Li welat şer û ceng e
Xwê ketiye nava agir de
Gelê me tê kuştin
Ez bendeyî te me
Tu li ku mayî

Îro wexte sibe dereng e
Mêrî çê yî xwendevan
Qey tu nizanî ku di şer de
Hêvî hawar û bang û deng e
Çima deng ji te nayê
Jiyan bûye agirê têr pereng e
Gere pênûsa te bikê qîrêna peng e
Xwedî derbikevê bi xûrêna lîlî û şeng e
Gelê me tê kûştin
Ez bendeyî te me
Tu li ku mayî

## hey gerîlla

1/
Gerîlla
    Xweş mêr û xweş pêlewan e
                                        Heval e

Karê wî ceng e
Bi nav û deng e
Bo jiyana azad  mîna şeng e
Pêçayî
Hûnandî
Bingeh saxlem û têr xîret
Xweş runandî
Mîna hevrîşmê bûyî peng e

Xweş
    Nijdevan û
            xweş ciwamêr e!...

Bi rojê li kar û bar e
Bi şevê piling û şêr e
Armanca wî mezin e
Xalî jiyan e
Nakê wesif nakê pesin
Nakê galgala têr qapan e
Sund xwariye bi baweriya welat
Ew welatê Kurdistan e

Gerîlla
Xwediyê desmala cemedan e
Kêlik rakiriye
Bi xwîna xwe nîşan kiriye
Gotiye erda bav û kalên min
Ji Behra Spî heya bi pişta Hemedan e
Sala hezarûnehsedûheştêûçar û virde
Rewşa welat ne weke dih û pêr e
Zor û zehmetî rabu
Hat xêr û bêr e

2/
Hey gerîlla
        Tuwî dîrok
                Tuwî çîrok

Tuwî kewkeba jiyanê
Di devê jin û dotan de
                    Bûyî sitran û dîlok

Wan şevên têr axên û nalên
Ji ber dijmin gidî gidyano
Zar û zêç dikirin hawar û zarên
Ne dost hebû
Ne jî yar
Mal hebû
Sitar tune bû
Bo dijmin bang û seyr bû
Bo Kurdan qîrên û hawar bû
Di rewa erdê de
Di pêlên avê de
Di xwîna li ser kuç û pelên darê de
Di cewherê dilê yarê de
Mezin bû kelî
Dirêj bû fûrî
Sal û dem sal bûrîn sar nebû
Daxwaz ji bîr nebû
Roj hat
Di nava kesk û sor û zer de
Kûlîlkên sipî şax û per dan
Hey gerîlla tu bûyî hawara Kurdan
Tu bûyî rûmet û xîret
Bi tîrêja rojê re
Ketî ser ruwê erdê de

3/
Barê te giran e
        Hey gerîlla

Ne roj
Ne heyv bi tenê
Reş û tariya ser axa me
Karê sed salan e

Ev bar
Ev barê giran
Barê tevî Kurda ne
Gere em teva dizanibin ku
Ne hêsaniye serhildan

Hey gerîlla
        Tuwî jiyan

Tuwî berxwedana me Kurdan

4/

Rê dur e
    Bar giran e

Her çar rexê Kurdistanê neyar e

Neyarên
Pirr hov û har in
Pirr zalim û xedar in
Ne bes kedxwer û zor in
Jiyanê dikine weke gemar e

Dijmin ne bes e
Hey hawar
Kesên xayin
Kesên bê esil û sêwî
Çav li derî
Xweliya sar li nav çav û serî
Pirr xedartir ji neyar in

5/
Xwîn xelatî
        Erd felatî
            Bingeha welatî

Hey gerîlla hey gerîlla

Wek destpeka pirtûkê
Çîrok û roman û dîrokê
Helbesta bi devê Cegerxwîn
Mamostayê vî zemanî
Bê xwendin
Bi pênûsa wî bê nivîsandin
Bi firça neqqaşê çeleng
Palê roja rengîn
Bahram Haco bê xemilandin
Bi dengê bilûra Memê Şivan re
Biçê ser pelê darê runê
Li ser kokel û şikêrên Dîyarê Behîvê
Li newal û geliyan temaşekê

Destpêka beharê
Heyva nîsanê
Di nav peşkê barana danê evarî de
Tu wî jiyan
Tu wî çirisandina çavên maşoqî
Bi navê Şeşimstana pîrozî
Tu wî dengê dilên evîndarî
Lîliyandina jin û dotan
Li ber siha dara beruwî
Kelkela havînî
Tu wî dilopa ava beriha serê Bagokê
Payîtexta Şahê Maran
Hemberî serê Ava Sipî
Tu wî Harran
Xwişka heft biran
Tu wî rewa erdê
Bûyî kûlîlka serê latan
Tu wî hestirê kewan
Li ser simbil û gulan

Şîr helalî
Ked zelalî
Deng pîroz û delalî

Lo
Tu derdê dilanî
Hey gerîlla hey gerîlla

6/
Hey gerîlla
Nav û dengê welatê minî tu

Li çiyayê Bagokê şêrên bi dengî tu
Li çiyayê Mava mêrên bi cengî tu
Li çiyayê Botan pilingê bi şengî tu
Li çiyayê Agirî wolqana bengî tu

Hey gerîlla
Şeng û penga dilê minî tu

Li Harranê heft birayê dîrokiyî tu
Li welatê jorî pêlewanê Battal î tu
Li deşta Wanê xweş beranî tu
Li Amedê cejn û dengê azadî tu

Hey gerîlla
Çav û gav û çeng û perê minî tu

Ne bes xan û man, rez û werz
Qesr û qunax, cih û warê minî tu
Ne bes tirş û pez, dibîstan û ders
Di jiyana bi rumet de xewrcbezê minî tu

7/
Şax û perî tu
Roj û gerî tu

Hey gerîlla

Kûlîlk û rengî tu
Kevok û dengî tu
Bang û miradî tu
Qubletgeha dilanî tu

Hey gerîlla

Şehlewendê pîr î tu
Mehrebanê şilîlxanî tu
Baqê sosin û gulanî tu
Di destên dot û xortanî tu

Hey gerîlla

Şewata kehrebanî tu
Navê Yezdanî Pakî tu
Delal û dilovanî tu
Ronahiya çavên gelê minî tu

Hey gerîlla

Hesreta behişta dilanî tu
Ehd û emana welatî tu

Hey gerîlla

8/
Hey gerîlla hey gerîlla
Bi meşe
      dem û dewran
                        ya te ye

Zal û Rastem
Kawa û Deysem kalê te ye
Welatê zêrîn Kurdistan dayîka te ye
Ev erd ev dil ev ziman behişta te ye

Hey gerîlla
Ev pirtuk ev pênus palê te ye
Ev xîret ev rumet bara te ye
Ev gotin ev galgal dabaşa te ye
Ev dîrok ev roman salifa te ye
Hey gerîlla
Ev ba
Ev bablîsok ev bahoz navê te ye
Ev av ev dîlok ev çîrok dengê te ye
Ev cejn ev govend ev pîrozî ev şahî
Ev civat ev deng û şabaş
Ev helbest bo navê te ye

Hey gerîlla
Stêrika li azmana
Heyva li çardeha taca serê te ye
Ev simbil ev şiva dara şîlanê
Agir û dengê hazretî Zerdeşt
                        germa dilê te ye

Hey gerîlla
Gotinê min şilîlxana xwîna te ye
Ev sitran şahûşîna ser gorna te ye

## davet e îro

Cejn e
        Ger û
                Seyran e îro

Îro
Daweta dot û xortên Kurda li dar e

Lê dixê zirne û dahol
Pê re çakûç û niqar e
Ne bes kêf û şahiya dost û yar e
Her çar wextên salê bi cih û war e
Li Kurdistan bûye hawar e
Agirê azadiyê ji serê çiyan
Xwe berdaye gund û bajaran

Govend germ e
Lê dixin çarpîne hişk û nerm e
Hurzê çepik û reqsa milan
Ew xweş baweriye ku ketiye dilan
Bo vê baweriyê ku bûyî dîlan
Bazdan û tirs êdî şerm e
Bi hêrs û şabaşên mitirban re
Di hejijê erd û azman
Lîle lîlê dot û jinan

Bûk li hespê sûwar e
Xêlî tê di pey de
Berbûlî ketiye ber de
"Narê hey narê
Mi çavê te reşbelek xwarê"
Narê xweş dost û yarê
Ji xem û derdan bûye dîn û harê

Hey hawar e
Îro bûye qîrên û ferman e
Ne wextê galgal û peyman e
Pêşmergên Kurda mil da ne hevûdin
Roj li roja din zêde dibin
Hew tên hejmar e
Hin leşker in hin jî milîs
Lê dixin roj û wextên êvaran
Hêrîşê di berdin ser hovên neyaran

Dawet e
Kurdan govend girtiye bi hev re
Îro çi xweş dem û dewran e

## em

Hezar in em
Hin xort in
        Hin pîr û kal in em

Bi hev re yekin wek dost û yar in em
Wek li Zêwa Seyit Bilal bi reng û deng in em

Doh
Hindik bûn em
            Îro hezar û hin in em

Xwedî kom in
Xweş nijdevan û paşmêr in em
Di bin kûç û rizdan de ne em
Li newal û geliyan e em
Li Tor û Rama û Serhed in em
Em îro hezar û hin kes in
Bo şerê azadiyê
Bo hember dijminên hov
Êdî bes in em
Hene em
Bê hed û hesab in em
Îro dizanim bêjim bê
Kî ne em
Bêjim bê
Çima em
Li kûne em
Bêjim bê
Li govenda welat in em
Li gund û bajaran
Cotkar û karker in em
Li dibîstan û kolanan
Xwendevanê têr huner in em

## kûlîlkên agir û xwînê

1/
Di çil rojiya we de
Va diçim
Di çime serê çiyan
Nava deşt û newalan
Lê ezê
Ji destpêka serhildana bi rûmet
Ji serê Çiyayê Bagokê dest pê bikim
Cihê hêlîna şêran
Ji mextela jin û mêran
Hinek dîroka kevnare
Hinek kûl û derdê ser pelê hinara
Ji ber kûç û talanê daran
Hinek taca rojê
Ya berê sibehî
Sor û zere ve
Kesk û xemre ve
Mîna liqatvaniyê kevnejinan
Ber hev bikim
Bikim baqê destan
Her baqî bi qozeqera biharê bi pêçim
Li ser sifra dilê xwe
Bênim bo we her du xatûna
Her du xatûnê rumeta Kurda

Her du xatûnê dilan
Heya cîhan ava ye
Bû ne dabaşa xîretê
Navê wan
Bû boyaxa pênûsan
Kete ser zimanê rûpelan
Ku dikin gotinê liyanê
Bi çakûç û miqaran
Hate kolan li ser mermer
Û cewheran
Ne dem dikarê xera bikê
Ne bahoz û baran
Ne berf û tofan
Mîna wan çîrokên têr efsane
Ku têne gotin ser kewkeba jiyanê

2/
Rê bigrim
Herim Çiyayê Mava
Nava darfêkiyan
Nava peyv û galgalên berê
Gazî û hawara sêwî û tawiyan
Sê denga bakim
Pîra ji Sêrtê tê diçê Bertê
Bo salifa xwe bêjê Cigerxwîn
Bo hozan ji nuh de runin
Runin bi nivîsin
Navê we bikin dabaşa helbestan
Bo sazbend bi têlên tambûra xwe
Dengbêj bi serê lêvên xwe
Bêjin bi belênin
Ziravê dijmin bi dirênin
Erd û azman bi welênin
Bêjin
-Kê bawerî ji vê mezintir dîtiye
Bêjin
-Kê mêranî ji vê mezintir dîtiye
Bêjin bi belênin
Gotin li dûv gotina dî
Ser dilê qîz û xortan bi kelênin

Bêjin
Bêjin û bakin
-Kesî ji vê mezintir welatparêzî
Ne dîtiya ne bînaye

3/
Di yeksaliya we de
Herim
Xwe bigihênime Serhedê
Nava nefel û helezê
Serê çiyayê Agirî
Warê serhildanê
Destpêka jiyana ciwanik
Û pêgiha cîhana gewrik
Parçek ji awaza we her du xatûna
Hinek ji rimiya agirê ser bedena we
Bi kûlmek xwîn re
Ya sor î sosinî
Bi çavên rojê re
Bikim ala Kurdistanî
Di ser kûraya dilê erdê de
Bi çikênim
Di nava wan gorbehiştiyê dîrokî de

Her sal bikim şeng û peng e
Gel bê zêwa we
Bikin cejn û deng e
Bi navê we destên hev bigrin
Raqsa Toranî lêxin bi govend e
Her sal nava rojê heya êvarî
Agirê dila pêxim
Hemberî roma reş
Bêjim
Bêjim û bakim
Bi sûnda ehda emanê
Wê sûnda dîrokî
Ya fêris û pêlewanan
Her bêjim û bakim
-Dijmin ji me re nabê dost û yar e

4/
Dengê awaza we
Dema giha Cudî
Ew rimiya ser bedena we
Bi govenda berxwedanê re
Mîna kûlîlkên berfê
Hatin jêr û rijiyan
Ketin ser stana Kurdistanê
Bû ne şilîlxanê beharê
Germa kevçika dilê we
Bû çavên Şeşimstanê
Ronahî da
Sibahî nîvro û danê êvarê
Hat û geriya
Kete nava newal û geliyan
Bû ba
Bû bahoz û weliyan
Mîna tofana Nûhê Kal
Şax û per û ger da
Hat û civiya
Pêl dan û rijiya
Bi Ava Mezin re
Pêlên giran û têr ger de

Hat û paland
Got û beland
Bû dilopa evîndarî
Niqutî dilê Cizîrê
Bû dengê Mem û Zînê
Bi devê Ehmedê Xanî
Bû dengê bilûr û sazê
Bû bexçê gul û gulîstan
Darfêkiyên welat
Kûlîlkên hinarê
Li qeraxê teyarê Helex û Zazê
Hat bû xumxuma dibîstan
Zar û zêçên Kurdistan
Mîna çûkên nava darîstan
Navê we her dû xatûna xwendin
Bela kirin li her şarîstan
Bi pirtûk û xêzikên helbestan

5/
Agir pêketiye
Li ser dilê çiyayê Kurdistanê
Geh li Bagokê di çirisênê
Gih li Çiyayê Mava
Li warê kûl û keserên kevnare
Warê fêris û dost û yara
Bi rojhilat re li Harranê
Wê rûpela dîrokê
Xwişka heft dînemêrên bira
Pê dikevê dibê find û çira
Bi rojava re li Serhedê
Kat didê li nava nefel û helezê
Kûlîlk didê bi bayê bez û lezê
Ew hawara awaza we her du xatûna
Di destên agît û pêlewanan de
Dibê ala rengî li welatê Kurdistanê
Desthilanîna we bû çavkaniya serhildanê
Kî çi bêjê
Hûn her du xatûn
Bû ne navê pesin û wesifdanê

6/
Agirê ser bedena we
Hat û rûnişt
Ser dil û kezeba min
Dengê nalêna we
Hat kete guhê min
Bû dabaşa
Helbestê min

7/
Roj na bûrê
Bê axaftina evîna we
Roj na bûrê
Canfedayî ya we nebê
Dabaşa civata me

8/
Kî di bêjê
Xwîn nabê kûlîlk

Reng nadê stana Kurdistanê

Kî di bêjê
Ew agirê ser bedena
Bêrîvan û Ronahî
Nabê kûlîlka sor î sosinî

Reng nadê ala Kurdistanê

Kî di bêjê
Xwîn û agir
Nabê nîgara jiyanê

Deng nadê civata Kurdistanê

Ger xwîn û agir
Dest bidine hev bi evîndarî
Ji xumxuma pêtên agir
Ji kelkela komika xwînê
Kat didê
Kûlîlkên wextê beharî

Di barin li ser rûwê cîhanê
Weke peşkê aşîtiya baranê

## pênûs na hilgirê

Pênûs na hilgirê
Gula geş
Ser Mishefa reş
Car din
Car din bikê dabaşa nivîsandinê
Nikarê
Dilê Şeşimstana gewre
Ku bi navê Ronahî
Ku bi navê Bêrîvan
Lê dixê
Car din bikê dabaşa jiyanê
Hew dikarê
Vê salifê datînê ser rûpelan
Mecal û mefer nadê
Hêl û qewet na ragirê
Her du delal
Bûne mezhebê baweriyê
Bûne dînê evîndariyê
Bûne pira navbera dilê mirovaniyê
Ne hewn dihilgirê
Ne dil diragirê
Wê şewata bi mêranî
Çawa biskên xelek
Keziyên reşbelek
Ber bayê agir ketin
Bûne rengê Tawusê Melek
Ew gorbehiştiyê deşta Yezdan
Li welatê Kurdistanê
Rûniştin ser textê dilan

## ger nebê

Ger
Neyê gotin bi navê we sitran
Nebê dabaşa dîlok û helbestan
Ne kevê roman û çîrokan
Bê xilafî çê na bê xelasî
Bo warê bav û kalan

Ger
Neyên ser gorna we
Tewaf nekin hicr û kêla we
Qîz û xortên evîndar
Sûnd ne xûn
Bi awaza we ya birîndar
Ne bêjin
Em biçin hawar
Rahêjin çek û dar
Xelasî çê na bê
Bo cih û war

Ger
Fêris û agîd
Rêzan û serkêş
Sûnd ne xûn bi êşa dilê we
Sûnd ne xûn bi agirê ser bedena we
Ne bêjin ev her du xatûn
Her du xatûnê gorbehiştî
Li nava duwelên biyanî
Bûne dil û ziman û ala Kurdî
Bûne xîret û rûmeta vî zemanî
Ji mer hew çê dibê
Hew çê dibê
Wilo dûrî hev rûniştî
Bi dilşewêtî
Bi evîndariya
Bêrîvan û Ronahî
-Divê em verin cem hev
-Em bikin galgal û yekîtî
-Ji hev re bibin dost û yar
-Na xwe çê na bê xelasî
Bo welatê bûyî çar parçê birîndar

Ger
Navê we bû dengê hawarê
Êşa dilê we bû dabaşa biratiyê
Xweşî û geşî bû qunaxa mirovaniyê
Kurdistan giha mirada xwe
Ya serbestî û azadiyê

## bê taqet
## di mênê pênûsa min

Pîroz bê
Pîroz bi navê Ronahî û Bêrîvan
        Li wan bedenê di nava pêtên agir de

Her du xatûn
Bezma dilê min in
Bezma xas û xweş delal
Mîna ava çavên evîndarên bê mecal
Taqet tê na gihijê
Zend na hilgirê
Hewn na ragirê
Dilê min têşê bi dilê jiyanê re
Ber ku pênûsa min
Hemberî dilê we bê mecal e
Ew baweriya mezin bû ne çavên rojê
Li ser ava ji hêstirên kewa
Ronahiyê didê ser rûwê erdê
Erda welatê Kurdistanê
Ew awaza we bû kewkeba jiyanê
Jiyana welatê Kurdistanê
Ew awaza we ku nayê wesifdanê
Xulînî kire nava Cîhanê

Çawa bêjê
Çawa bênê ziman pênûsa min
Hawar bû hawara cihê bav û kalan
Hûn gihana hawara cih û waran
Bawerî bû baweriya dot û xortan
Hûn bû ne baweriya dost û yaran
Çawa dikaribê
Çawa wê bi kar bênê
Ka ji jiyana we mezintir û geştir helbest
Ka ji canfedayî ya we xweş û pîroztir helbest

## emanetê we

Emanetê we
Ew emanetê pîroz
Di destên heval û hogirên çê de ye
Hogirên agîd û fêris in
Piling û şêr û xas in
Xeyala nekin
Qet
Bê mitale û rehet bin
Her roja ku tê
Birrê xortan
Qeflê dotan
Mil didine hevûdin
Weke hûn dizanin
Pazdehê tebaxê
Destpêk kom bû
Koma ronahiyê
Piştir bû nê hêzên bi rêz
Rêzên kûlîlkên beharê
Lê îro
Bi hezaran palê rojê ne
Leşkerê palê rojê
Raf bi raf
Hêz bi hêz
Li welatê Kurdistanê
Ronahiya rojê ber hev dikin
Serê çiya bi dar û bar
Qeraxê avê bi gul û reyhan
Hêviyê dikine lod û berçav dikin
Ew hêviyên dilê evîndar
Ew hêviyên tovê jiyanê
Bo emanetê ala rengî
Bi azadiya bengî re
Bikin xelata Kurdistanê

## wê bê

1/
Roja me hilat
Sala hezarûnehsedûheştêûçaran
Barî ew rehma têr xêr û baran
Bi rimiya agirê Zerdeşt
Bi findika dilên evîndarî
Bo roj û ehda peymanî
Bi navê pêlewanên axir zemanî
Yên ademî
Yên bav û kalên pêşî û dawî

Kevir û kuç hêrivîn
Mêjî û cewherê dilan werivîn
Kulê sedsalan bu ne şikêr ketin ser hevûdin
Ew zilm û zora kedxwerên hov ji wan re ma
û serifî

Roj
Hat û
Hilat
Ax û av
    Dar û devî rabûn
        Mil dane hevûdin

Çiya û gelî
Bu ne rast û meşîn
Ew dilo-jarên têr girî
Têr qîrên û nalênên reşî
Bo bibînîn rojên xweş û geşî

Bo bê
Dengê zar û zêçan bi xweşî

Bo bê
Dengê bilura şivanan bi naş û nêşî

Bo bê
Ew roja têr xelat û têr pîrozî
têr ronahî û têr geşî
Roja me hilat
Pêşmergên şehlewendî
Bi wî dengê kulîlkrengî
Jiyanbanga xwe kir
Bo gelê Kurd neçê helak
Bi serfirazî bibê felat
Bo azadiya axa zêrîn e welat

2/
Roj va ye hat
Kulîlkan vekir
        Gelê Kurd serê xwe rakir
                        û bakir

Gelî wêrt û waran
Xort û kalan
Dot û jinan
Dost û yaran
Xêrxwazên me Kurdan
Dizanibun ku ev car e

Ku welat nebê azad
Xelas nebê xanûman
Cih û war
Kûç û erd û dar
Xêr na mînê
"Ezel û ebed"
Li ser ruwê cîhanê

Ku me azad kir welatê bav û kalan
Wê xêr bibînê rojên bê
                    Cîhan
                Û bêrtên waran

## behar û serhildan

Serê sibehî
Bi banga rojê re
Bi dengê çûkan re
Yên Memê Şivan û
Gavanê Zerzan re

Topa kûlîlkan çavên xwe vekir
Kesk û sor û zer gewhera sipî
Xemla bûkan li xwe kir

Destpêka beharê
Jiyanê serê xwe hilda û bakir

Bo
Di atlasa dilê merivan de
Xweş ciwamêriya têr xîret
Bê neqişandin
Rengo rengo
Bê hûnandin
Çengo çengo
Baqo baqo
Bibê girîş
Û lodên xweş û geşiyê

Xêzik bi xêzik
Bên nivîsandin
Hin bibin helbest
Hin bibin dîlok
Hin jî çîrok û dîrok
Li ser her çar wextên salê bên gotin

Da
Bibê destpêka serhildanê
Bi navê Kawa yê hesinker
Bi dengê çakûç û siddanê wî re
Bi "Hingêlyo" ya lîstika zarokan re
Bi tewirandina diber şerran re
Di nava koma mêran de
Li dîwan û koçkên ciwamêran de
Bi lîle lîla qîz û jinan re
Di daweta kur û dotan de
Di rêya bêriyê de
Di govenda Toranî de
Li ber destêr
Li ber guv-guva dolabê re
Bi "Xumxumê Torîvan" re
Mîna dîlokên evîndarî û cengê bên gotin

## av zelilî

Av zelilî
    Herikî hat ser pel û mista dilan
        sekinî

Niqto niqto
Bar giran bu hat kete ser milan
Pelê dara kurmî yeko yeko weşiyan
Reş û sipî
Qenc û xerab
Ji hevûdin wejiyan
Ne hêsanî
Ne bi yek û du gêsinî
Bi sal û wextên giranî
Bi rewşa zor dilovanî
Piştî xwîna hezar û hin gewrekanî
Xortê delal
Kal û kendal
Kerr û kerrendal
Mîna Qaz û Qulingên beriyê
Ku berê xwe dan geliyên Zozana
Bi şêwr û mişêwra cenga fermanî
Zikreş û dilseqet
Çavçêlek û xayinên vî zemanî
Ji welatparêzan veqetiyan

Ava genî zelilî
Ava cirnik û bêrman
Ya hewt û çalan
Peşk bi peşka baranê
Di nava teliyên destan de
Li ser lêvên jiyanê
Hat û sekinî

Behar e
Welat karxezal e
Bejin zirav û narîn
Û xwîn şêrîn e
Mirin pirr bê jî
Her dilopa xwînê
Cejna Newrozê ye
Xweş pîroziye
Destegul e
Baqê zadên têr simbil e
Şenga Şalul û Bilbil e
Banga roja hewn û dil e

## doh û îro

Ew Kurdên xwedî çem û çogan
Bû ne xwedî mêrên wekî hogan

Doh mahkûmên qaçax û xwêkiyê bûn
Îro xwedî şervan û nijdevanên mêrin lo

Doh kuştî û birîndarên Romiyan bûn
Îro bi çek û çekdarî xwedî komên serhildan in lo

Doh hemberî hev bun hev di kuştin
Îro yek in radikin komên berxwedanê lo

Sed û pêncî sal in bê kes û kûs in
Îro xwedî serok  û pêşmergên bi hêz in lo

Demsaleke welat bi ax û nalên û wêran e
Îro şerê cejna şilîlxana ala rengî ye lo

Ew Kurdên têr kuştin têr perçiqandin
Bû ne şêrgelên xwende û hûnerên mezin lo

Ne di bin rima xelkên kedxwer de ne
Îro rahiştin şûr û mertalên cenga azadî lo

## kewkeba jiyanê

Hey gerîlla yên Kurdan
Heval û hogirê te me lo
Ji rê û daxwaza te re
Ji şer û berxwedana te re
Bingeh û sitara te me lo
Kewkeba jiyanê tu wî lo

Doh li serê çiyayên Tora Hevêriya
Îro li Çîyayên Mava û Rama û Deşta Muşê
Li Sinceq, Harran û Hesen û Heyderan
Ji çiyan bigre heya bi berî û deştan
Banga xemla govenda azadî tu wî lo
Kewkeba jiyanê galgal û fikrê te ye lo

Hey gidî pêşmergên Kurdan
Xwezî cih da ye hêviyê lo
Hêvî bû ye doz û armanc îro
Roja te fîşek ajote devê tivingê
Te pêxist agirê Kawa yên hasinker
Dem û dewrana azadiyê ye hey lo tew lo

## qesîde

Qutê salê genimê ruto
Hat bir ji ser ban û bênderan
Ew Roma reş î gurê luto

Na hêlê werz û rez û pez
Tê dibê bi hêbeta bez û lez
Ne kitên di hêlê ne piça gez

Dijminê Kurda har û hov in
Tu nikarê li pêş û paşiya wan
Bi meşê ji ber ku ne mirov in

Pirr bi lom in û têr qurredar
Ne li şerqê nê li xerbê
Çê na bê mîna wan zor û xedar

Tu li pêş biçê wê gez bidê
Tu li paş biçê wê şoş bidê
Ku te berê xwe dayê wê ken bidê

Ne tê şor û peyv û galgalan
Qedexe dikê heya bi xemûxeyalan
Na hêlê deşt û gelî û newalan

Ew tuxmê mongol û barbaran
Dîroka wan teva kuştin û xwîn e
Teqepaşî na diyê dinalînê bi hezaran

Bingeha jiyana wan zilm û zor e
Ne dizanin mirovantî ne dost û yar e
Nas nakin ne ol û ne bext û tol e

Heçî Ereb û Ecem û Tirk in
Ne bes bê xêr û xêrat û xelat in
Bê kewn û bê "sewm û selat in"

## nav û
## rê ya te

Hember mirinê jiyan e xebata te
Hember hunda bûnê berxwedan e rê ya te

Sorgul e sitêr e li ser situna konê şîn
Tîrêjên rojê ne her dilopa xwîna te

Ew rêya te ya têr kirin û mirin
Gorna behiştê ye bo cejna welatê te

## rê ya azadiyê

Rê ya te zor û zehmet e
Bi lom û galgal û têr tohmet e
Hey gerîlla

Rê ya te tejî çal û qonçal in
Tejî kemîn û kesên xayîn û muxbir in
Xayîn bêjî û sêwelekê devê deriya nin

Hey gerîlla
Nan hebê av tunîne
Her du hebê heval tunîne

Hey gerîlla lo bav û bira
Ew rê ya têr dirrih û xefk û mirin
Rê ya gewre ya azadî û geş û beşî ye

## jiyana bi xwe dest

Pirr kel û germ e
Jar û şîn e jiyana girtî ya bindest

Di qermiçê pişkoka dilê min
Di punijê avoka mêjiyê min
Ser mirina xortên bê mirad
Ser rijandina xwîna gelê min
Hewn na ragirê dil na hilgirê

Ev mirina bê kewn û wext
Tê bi destên dijminên bê bext
Di şewitê sorkezeba min
Di herhilê gerhinavê min
Ax na hilgirê av na ragirê

Eyb û ar û şerm e
Ku nebê şeng û penga jiyana bixwe dest

## bang û agahdarî

1/
Hun dizanibun
                    Ku

Ez
Ne evîndar im
Bo xwîn û şer
Xwediyê doza xwe
                        ya nav
                              û
                              deng im

Xwediyê
         maf im

Hember zorê
Mêrên çê
Weki deq im

Bo hebûna xwe
Şer jî bikim ez
Ne xelet
       Ne niheq im

2/
Hûn dizanibin
Ku

Ez
Xort im
Çeleng im
Di doza welatê xwe de
Şêr û piling im
Evîndarê Cîhanê
Kewkeba jiyanê
Yarê çavên reş-belek im

Ne bê şeng
û peng im

Pişkivtina pişkoka dilê
Azman û erdim
Weke tavên beharê
Heyva nîsanê
Li ser hêlîna
Bilbil û kevokê
Çîrên û xumxuma deng im

Li ser ferşikê bingeha jiyanê
Mîna kewê ribat im
Tim palê merivantiyê
Tim avaza ceng im

3/
Hûn dizanibin
                    Ku

Ez
Îro
Merivên zana
Têgihiştê hewn
                    û dîtina
                              xwe me

Ez bixwe deng
Ez bixwe bang im

Xwendevan im
Hunermend im
Sexmankar û mamoste yên
Erd û azman im
Lokman Hekîmê
Neçar û beçar û
Bê kes û kûsan im
Zembîlfiroşê
Rumet û xîreta
Namus û ar im

Ez im pêlewanê kewna rojê
Li ser ehdûemana qewl û sozê

4/
Hûn dizanibin
Ku

Ez
Bi mefer û mecala axaftinê
Bi biratiya xwarin û vexwarinê
Bi jiyana mirovantiya serketinê
Bi rê ve diçim

Ez rêwingiyê kewna yekîtiyê
Palê bejna levakirinê
Hostenecarê vekhevkirinê me
Ez li cengê çekdar im
Li kar xwedî barên giran im
Sozdarê roja qewamê
Bi cîranên xwe re
Her dem dost û yar im

Ew cîranê têr dost û yar
                        Azad in
                            Ez bindest im

Ew xwedî welat in
Ez bê cih û war im
Ew ne bes bu balam
Ez talan kirim îro jî
Li derê welat neçar û mihacir im

Hawar gidî ez firoştiyê çar warîl gaz im
Gere cîhan jî dizanibê ku ez ne kodika
                                        şikestî ya saz im

Ew ne bes bu balam
Ez girtim/Ez helandim
Ez kuştim/Dilê zar û zêçan kelandin
Ne şiştî birim veşartim
Bê gorn û mextel hiştim
Cîhan kete demsala bîstûyekê de
Hê jî ez bê kêl û ferş im
Ew cîranên
        Ku min ji wan re kir
                            Bi dost û yarî

Ne şerm kirin
Ne jî eyb û arî

Dilê wan jî ne şewitî
Ne sax hiştim ne kuştî
Mîna pazê gura xwarî
Mixabin li erdê hiştim bi birîndarî
Di nava gola xwîne de wilo vezîlandî

5/
Hûn dizanibin
                Ku

Dijmin ez rezilandim
Di nava xwînê de xemilandim
Bi derbehişka qewirandim
Bo jiyana bê rûmet
        û mirovantiya bê xîret
                bi qest, bi zanîn
                        tim ez şemirandim

-Kûr lê dan
-Dûr nêrîn
-Nan û av û hewn
        û zar û ziman

Ji rayên binî kesixandin

Ez bê xal û ap hiştim
Ji jiyana malbatî û welatî dûr xistim
Mefera min ma berxwedana çekdarî
Micala min ma serhildana bi şîretkarî

Hûn dizanibin
            Ku

Ez
Ne evîndarê
Rijandina xwînê me
Palê xerabûn û cengê me
Bes,
Ez
Xwedî doza mafê jiyanê me
Jiyana mêrga têr helezî me

Ez dost û yar im
Mixabin xwediyê
Dijminê hov û har im
Ez palê bar giranim
Mixabin bê par û war im

6/
Hûn dizanin
          Ku

Ez
Şemala ronahiyê
          Azadî
     û rizgariya cihê Zalê me

Bang û xemla çav û dilşahiyê me

Lê berî her tiştî ez sozdar im
Sozdarê welatê xwe me
Çekdar û şervanê pergela
Dilê Şeşimstana xwe me
Nijdevanê deşt û newal û çiyayên xwe me

Ez
Ziman û dil
Çav û gav
Nav û nas
Û pir nefesa
Gelê xwe me

Şiyarim îcar
Ser çavên xwe avêt min
Ew tozik û xweliya mirinê
Dizanim îro
Wek Teyrê Baz im
Çeng û perên xwe vekir min
Xwe hilweşand û
Dergehê azadiyê bê kilît vekir
Îro ez
Cotkarê pêlewan im
Kom û palûta min
Bo jiyana têr rûmet e
Piştî û barhilgiriya min
Baz û reva min
Bo nav û nas
Bo cih û war
Û kes û kûsên xas
Îro ez
Xwedî Leşker
Û Memê Şivan im
Xwedî doz û soz im ez

7/
Hûn dizabin
          Ku

Ez
Xwedî werz û pez
Xwedî dexl û zad û rez im
Xwedî ol im
Navê deşta Harran
Û Serheda têr helez im
Ne bê cih û ne li der im
Ne hesûd û zorê bi merem im
Ji kesî jî ne bi xerez im

Hûn dizanibin

Ez
Bo maf û şedûbeda xwe
Sibehî
Nîvro
Êvarî
Bo ked û xwehdana xwe
Bi roma reş re
Bi pevçûn
Û berz im

Hûn dizanibin
Ku

Ez
Bêr û tevr û das im
Nîr û halet û misas im
Teşt û beroş û tas im
Agirê navbera her sê lingên
Tifika hesin û risas im

Ji malbata xwe de
Ling li erdê
Dest li ser derd û kûlê bê hejmar
Dermanê birînê bê derman im
Bê çiqasî xêrxwazim
Hewqasî jî mêrxas im

Berx im ez
Beranê ber kêr im
Di cengê de weke pilingê har im
Her banga û hêrîşa min
Weke tevr û das û kêr in
Weke Haco
Li Çiyayê Mava
Li ber kêr û xencera
Roma reş jî mêr im
Bo doza gelê xwe
Li ber mirinê
Weke şêr im

Hûn dizanibin
Ku

Ez rênas û gernas im
Ji bav û kalên xwe de şewrexî segvan im

## jiyan xweş e

Jiyan xweş e/ bi evîndariya dilan
Ku derbas bibê/ bi kêf û seyran
Weke rafê kewan/ li serê çiyan
Bi karê xwe dest û azad

Bi rojhilat re
Ku tîrêjên zer û sor û kesk
Bi qozeqera xemrî re pêl berdane ser bedena erdê
Bi dilopa dilê mirovantiyê re deng da/lebitî
Erda hişk/hejand
Deng da/qewirî
Pişkok pişkivî
Cewherê jiyanê çirisand
Av û ax bi hev re/çirmisî
Pêlên germ
Pêlên nerm
Pêlên rengîn
Qalin/dolemend
Comerd
Bi hevîrê miradê re/pelax bûn
Rûniştin/dest dane hevûdin
Axiftin
Beşişîn/soza evînê dan
Axê bêhn da
Hilma germ pê ket
Xem û xemhilgirî nema
Hingî jiyan xweş e

Ku Şeşimstan rûnê li ser textê agir
Bêjê/bi belênê
Hêdî hêdî bi palênê
Pal bidê bi welênê
Dayîka jiyanê
Werê deynê
Kom bi kom/lib bi lib
Bela bikê
Li ser pelê daran
Bi sitraneke evîndarî
Ji devê dot û xortan
Bi wî dilê têr hêvî
Nûh nûh şîrîk girtî
Têr kel
Têr germ
Tirr û xuloxafî
Mîna hêlhêla zarokan
Wan kûlîlkên jiyanê
Di nava leyistikên êvarî de
Li ber tava heyvê
Li dora agirê geş
Jiyan xweş e
Ew jiyana bi dil/bi xwe seyran

## xayin felek

Hey gidî
Gidî xayin felek
Min kir û nekir
Ji destên min venebû
Ew hesinê bi xelek

Gih di hepisxanê de
Gih di ger û xefkên roma reş de

Bi jêr de bezîm
Bi jor de bezîm
Min çawa kir fêde nekir
Dest û lingên xwe palandin
Çavên xwe gerandin
Hewnê xwe tev lewandin
Min kir û nekir
Miherkên kewna jiyanê
Min bi darve nekir
Ta xaf bû
Ne teşiyê pêçan kir
Ne dolabê badan kir
Ne ferê aşan zîvirîn
Ne destikê destêr
Mecal û ferece kir
Ne cot kar kir
Ne rev û hilandinê

Kar û barê bindestiyê
Ava Çemê Bûnisra bê jî
Têra xwarina kedxwerên
Romê
Û wan terezên xayîn ne kir

ez

1/
Bahoz û ba me
Li ser çiya di fûrim
Li gelî
Û mesîlan
Bi dengê bilûra Memê Şivan re
Li ber hicra Hexê Bêsa
Di lorim
Bi govenda jiyanê ra
Dîlan û seyran dikim
Peşkê berf û baranê
Bi kêfa germa rojê re
Bi rengê xuzeyî
Bargirê axê dikim
Tovê dar û geyê
Kûlîlk û gulan
Bi cih û war dikim

2/
Ez Lokman Hekîm im
Hem birîn û derman im
Bi derdên dilê axê re
Mişt û mişa me ez
Bi doza Kurdistanê re
Havîna kelî û germ im ez
Şor û doz
Şer û xwedî me ez
Tiving û ber
Sorgula aşîtî me ez
Her dilopek ji xwîna min
Find û çira ye
Bo azadiyê bingeh û derman e
Her dilopa xwîna min
Germa dilê jiyanê
Li ser axa welat
-Sorên zelal e
-Zerên delal e
-Keskên helal e
Sipî yên gewherî xal e
Kûlîlk û şilîlxan im ez
Şehîdê berxwedanê me ez
Nîşaniya azadî me ez

## xwîn xelat e

Bi destpêka rojê re
Rûniştim li bin siha darê
Bo galgal û gotina
Bikim ristik

Wan ristikê bi destik
Bidim xelata yarê

Yek destik
Du destik
Destika sisiyan ket û rijiyan
Belabûn li nava axê û zûrik
Hin bi wir de hin bi vir de reviyan
Ji min ne hat car din berhev bikim bixim tûrik
Ez ketim heyra bêçariyê
Dotên gundê ma hatin
Li galgal û gotinan civiyan
Yek bi yek dane hev û keniyan

Kenê wan pirr ne domand
Ji wê de hatin ew bêbavên romiyan
Weke gurê har zuriyan
Ketin nava mal û xaniyan
Zad û zewad teva rijandin
Kar û kûwar teva şikandin
Zar û zêç teva welandin
Kal û xort teva civandin
Bi darê zorê koç kirin
Bi wan hêrzê terezbavî
Sixêf kirin bi zarê romanî

Dotên gundê me li hev civiyan
Ji xwedê xwezî û daxwaz kirin
Dengê xwe jî ne hildan şerm kirin
Dawî yek ji wan rabû ser piyên xwe
Got: **Dotên dê û bavê xwe**
**Bi xwezî kes rahêjê baqê kezî**
**Rabin ser xwe şerm nekin bidin xwe**
**Galgal û gotinên bav û kalên xwe**
**Bikin şîret û bixin gûhên xwe**
**Em bigihin xortên gundê xwe**
**Rahêjin çekan bidin milên xwe**
**Bo em bikin doza welatê xwe**
Yeke din rabû ji wan bersiv da
Got: **Dotên dê û bavê xwe**
**Divê şivan hebê pez koz bikê**
**Divê cotkar hebê cot bikê**
**Divê pale hebê palûtê bikê**
**Bo kar û bar li dar bibê**
**Da em qirşûqalan ber hev bikin**

Şor kirin pirr hindik
Da bikin doza welat
Hember roma reş şer bikin
Dê û bavan bikin felat

Ew galgal û gotin rijiyan
Berhev bûn hatin civiyan
Ketin devê dot û xortan geriyan
Ketin nava gund û bajaran
Ketin gelî û çiyan hilkişiyan
Ji havûdin veketin zêde bûn
Can bi wan hat û meşiyan

Hawar e
Erd û ava welat bê hal bû ye
Dar û devî deşt û newal bêçar ketiye
Di bin ling û destan de bêzar çû ye
Keriyên pez bê xwedî û şivan ma ye
Xêlî û berbûlî ne hat di rê de ma ye
Bûk di mala bavê de xwedo bêhal ketiye

Roj hilat
Û qewimî
Memê Şivan hat û qîr da
Çem û çogan hejand û meşiya
Bi yek carê
Gel da duv û di hawarê beziye
Reştari hûnda bû
Jar û şîn bela bû
Xweşî hat û runişt
Gelî û çiyayên melûl
Bi yek carê geş bûn
Newal û deştên bê deng
Bi yek carê bi bang û deng bûn
Şeşimstan bi wan çavên evîndarî
Ronahiya jiyanê bela kir
Ew ronahiya xwîna xortên Kurda
Ew ronahiya çavreşên karxezal
Ew ronahiya gerden bi mûrên delal
Bû ne çavkaniya jiyana azad
Li cîhanê bela bûn
Bû ne sosin û gulê baqê destan

Xwîn bû xelat
Xelata azadiya welat

## bêjim

-Bo bîranîna Abdusselam Akgül-

1/
Bêjim
Weke Dawut gotî
-Biçim azmanê hefta
Warê gorbehiştiyan
Cihê xwe li keleka te deynim
Berê sibehî
Berî xwêhdana şevê bikevê ser rûwê erdê
Pelê daran
Sitirî
Kûlîlk
Zûrik bi çirmisin
Kevir
Kûç
Bi çirisin
Dîk
Çûk
Ji lîsê xwe derbikevin
Zarok
Ji nava cihê xwe bazbidin

Rabim
Çeng û perê Derya Sipî bistînim
Herim
Herim dawiya Okyanûsê
Di nava kûraya rengê şîn de
Bi agirê dilê te
Rahêjim baqek geyaşilk
Bênim
Di nava tava rojê de
Bi meyênim di tasê de
Lewlebê darvekim
Bi her du destan kewkebê bigrim
Bi keyênim di meşkê de
Bo reş û sipî ji hevûdin veqetin
Reş bi qeşitin
Bi kevin warê kora de
Sipî
Bi tîrêjên rojê re
Di ser sîvanoka derî re
Bikevê ser balgih û zembelîşê te
Bibê rengê pirtikên ordeka berrî
Li qeraxê Çemê Bûnisra
Bibê nîşaniya oxira te
Wê oxira dawî
Çûn û nehatinê
Cihê mextela pîroz
Ser wê dilopa xwîna te
Ya pêşî
Wê kêlîka niqutî ser erdê

2/
Bêjim
Bi belênim
Çiqas dîlok û sitran hene
Ji wan dengbêjên kevnare
Yek bi yek bi neqilênim
Bi wê hesreta dilê te
Wilo bê hesab
Hewqasî dilovan
Dilxwaz
Ku
Te
Berê xwe da mirinê
Wê
Mirina têr ronahî

3/
Bêjim
Ew kevirên ketî ser dilê min
Bi zimanê dîrokî
Bi nalên û axêna coxrafî
Bi hesabê fîzîk û kîmya
Bi pîvana dilopa baranê di nava derya dilan de
Bi evîndariya bê mirad yek bi yek vejartin

Ew kevirên hêrivtî
Bê mirad û dil şewitî ketî ser kevçika dilê min de
Bûyî şikêr
Te bi destên xwe hilandin
Ew kevirên zemanî
Girtiyê salan
Dîrokî
Têra xwe kevnare
Giraniya demsalan li ser wan
Bi xwîna xwe ku tevlî keda bi xîret bûyî
Te dilê min derxist
Ew dilê qermiçî
Pûnijî
Bê rewa mayî
Ji nava şikêrên têra xwe kevnare
Têra xwe evnikî
Di binê geya gutin û piyan de mayî

Tu
Bûyî destpêka jiyanê
Nûjên
Ciwanik
Bo lêxistina dilê min
Ew dilê bi hesreta serxet û binxetê
Wî warê ji hevûdin perçe perçe bûyî
Ew dilê bi hesreta evîna welat

4/
Wê
Dayik
Çawa bi hejênin
Çawa zarokên xwe
Bi lorînin
Di dergûşa dilê xwe de
Bêyî ku navê te bêjin
Di nava wan gotinên nerme
Di nava wan gotinên evîndarî de

Wê
Dayik
Çawa bi dikirênin
Di nava lorandina nîvê şevê de
Çav li xew
Westayî
Sist û di bawişkî
Bi wan lêvên sore ve
Mîna kûlîlkên hinarê
Hêdî hêdî
Di nava wan gotinên nerme de
Bêyî navê te bi dikirênin

Wê
Çawa bêjin
Çawa bi dikirênin
Bêyî bîranîna xwîna te
Wî rengê sor î sosinî

5/
Bêjim
Bê
Wan
Xortên Kurd
Wan gorn behiştiyan
Wilo dilxwaz
Hewqasî dilovan
Xêrxwaz
Bi wê berxwedana mezin
Ji nava reşa zordestan
Ji nava tariya sedsalan
Ji kûraya gorna dîrokê
Welatek nûjen
Welatek azad ava kir

Bêjim
Bê
Şehîdên Kurdistanê
Bûne haveynê jiyanê
Bûne xunafa qeraxê dilê evîndaran

Bêjim
Bê
Ji şevên bê sitêrik
Ji rojên bê tavik
Xelatek pîroz
Xelatek ji cejna Newroz
Ew xelata azadiyê di destên me kir

6/
Dibêjim
Wê roj bê
Ku
Zar û zêç
Bi çîrokên we
Rûpelên defterê xwe dagirin

Ku
Bi xweş mêraniya we
Bi civatî
Bi kom
Sitranên we bêjin

7/
Dibêjim
Roj wê bê
Ku
Dayik
Dergûşa xwe
Xuşk
Birakên xwe
Bi navê we bi lorînin

## doz

Karê dot û xortên delal
Bo welatê xwe bikin xebat

Ber doza welatê Kurdistanê
Dozek pirr zor û giran e

Lê ne derdê bê çare û derman e
Ku Kurd teva bikin hawar û ferman e

Li serê dijmin bikin reş dewran e
Dijmin wê bi revê bi raf û qeflan ne

## şerm e

Jar û şerm e
Kesên nekê kar
Bo welatê xwe nebê yar
Ne bêjê
Azadî
Xweş xelat e ji bo welat

Jar û şerm e
Kesên ne bezê
Ne kevê govenda cengê
Bo serfiraziya rûmetê
Kevçika dilê xwe nekê
Perengên germ e

## bi hesret im

1/
Îro,
Şînîk û weyn e
    Li newal û gelîyên dilê min
                    dibarê berfek bê terş
                              û bê kewn e!...

Hawar,
Zembelîlk xwe pêde diberdine xwar e
Zemherî ye,
Hey dilo jarê çiqas sar e
Galgal û germa gotinan xêr nakê
Hawar,
Xêzikên helbestên Cigerxwîn
Dengê Cimbuşa Aramê Tigran fêde nakê!...

Îro,
Ji her roj bêhtir
Dilê min bûye çavkaniya kulan
Dizê,
Dirijê bi milan
Difurê bi dengê baqê destan
Diherikê bi axên û nalên
Bi hawar û qîrên
Li hev di civê
Dikelê,
Diwelê,
Dinalê,
Dibakê!...

Hey dilo jarê
Nakim dengê dost û yarê!...

Kûl û maraz,
Dibê hesreta têr xerez
Li hev dicivê
Dibê bêrm
Di kevê qonçalan,
Cok û xirêman...
Na xuşşên pê dikevê
Ne mişşên,
Ne jî mirrêna rijandina ser ax û kuçan
Wilo bê deng
Wilo bê bang
Li ser kezeb û dilê min
Hawar, dikê ceng
Weke agir
Agirê têr parangên têr şewat

Hey dilo jarê
Şewata têr hesret!...

2/
Îro
Jar û jan e
Li welatê biyanî
Dilê min derya kûla ne
Şape û lehî
Lehiya têr gera pêlan
Di ser hevûdin re diqulibin
Bi hişma derd û merezan
Bi xezeba hesreta cih û waran
Mixabin
Derya dilan bê qerax e
Evîndarên tê de
Çiqqas xewas bin
Mixabin na gihin war û qunax e
Mixabin bê arîkariya Yezdanê Şeşimstan in
Çeng qurimî
Hewn cemidî
Dinava pêlan de xaniqîn
Pêl na gihin bejê
Beja bi lat û zixurên têr qum û ax e
Keftûleft bi awaza wax e
Nadê mecal
Nadê per û şax e

Dilo jarê
Dergehê welatê biyanî tenur e
Tim dada ye
Tim bi agirê têr pêtên wa ye
Ne nanpêj li ser e
Ne ew jinên kal î têr şah û şanbêj
Hawar ew hovên dijmin
Bi bistên mîna tîran
Dilê min di kolin û dibirêjin

3/
Bi hesret im
Hesreta bejna zirav
Çavên reş-belek yên kildayî
Birhên dirêj î kevanî
Gerden gaza bi morîk
Rudêna gewre
Hinarkên rûwa mîna sêvên xelatî
Di nava gotinê dîlokê de
Li ber berê paleyiyê
Ew hinarkên ruwê gewrik
Ji germê sorxalî
Wê germa havînî
Dengê yarê bê
Wekî bayê hînik
Li bin siha darê de
Ava sar di tasê de
Tas di destê yarê de
"Hê wernê wernê
Werne darxizêmê"
Xizêma av bi darê
Xortê gundê me çune hawarê
Hawara welatê Kurdîstanê
Yar dîlberê
Felek xayînê
Xefka dijwar veda ye
Na hêlê bikevim berê yarê

4/
Hey dîlberê hey dîlberê
Kezî zerê çav bi kederê
Min sund xwariye
Bi sunda mêrên berê
Heya navê te ne kevê defterê
Li nava Cîhanê nebê keda tevgerê
Venakim ji pişta xwe rextên kemberê

Kembera min zîv û zêr e
Bi ser de di hejê xencer û kêr e
Kesera dilê min dernakevê
Heya li Kurdîstanê ne bê azadî û xêr e

5/
Dil bi keser bê
Na çê bihiştê bê xebat

Divê xebat hebê heya ava bibê Birca Belek

Bo kezî zera welat
Hêjaye xwîn bibê xelat

6/
Dilşawêt im
Kezeb herhilî

Ji zor
Ji zilmeta dijminê hov
Bê cih û war im
Li walatê biyanî
Kor û
Ebkem
Û lal im

Mixabin
Durî dost û yar im
Bi hesreta walat
Têr şînîk
Têr weyn
Û jan
Û jar im

Hawar
Bi hesreta walat
Dîn û har im

Hoo gîdyano
Li mihaciriyê
Ta xaf e
Galgal belaş e
Dayik bi gorî
Bi teşiyê tenê kar nabê
Guv-guva dolabê
Bê dabaşa dilketinê
Bê çîrok û çîvanok
Bi kesî xweş nabê

Li welatê biyanî
Roj punijî
Tav darê şikestiye
Tov ber bi ba ye
Halet şikestî
Nîr bê kûlab e
Ga pîrr e
Cot
Li dar
Û bar nabê

7/
Bi hesret im
Hesreta Beriha Dilopa
Ber siha kavilê Dêrxerabkê
Hemberî Cizîra Bota
Warê evîna dotan
Keliha mîran
Rûnim û bêjim
Bi devê Celadet Bedirxan
Li ser ferşê Kahniya Qetraniyê
Gundê Hesenê Haco
Ji xwe re bi tewirênim
"Dilê min hêlîna teyrê narîn
Dilo çima hewqas tu di kolî tû di nalî
Xwezî careke din min danîba ne
Li wî cihî li wî warî"
Navsera çiyayê Bagokê
Cihê derd û kûlan
Mextela bav û kalan
Bi wê hesreta nêçîra rafê kewan
Bi çîtika rengî
Bê pêjin hêdî hêdî xwe berdim
Ber bi Bazinê Taqa biçim
Cihê agirê Zerdeştê Kal
Serokê welî û pêxemberan
Li ber kêlê şehîdan rûnim
Qûbletgeha me Kurdan
Sê cara tewaf bikim
Sê cara berê xwe bidim Şeşimstan
Bêjim: "Şilîlxan bi ketin Kurdistanê
Wê topan berditin Tirkistanê
Textê raketin bibin Kurdistanê
Qeda wê bi kevêt mala Erebistanê"

8/
Bi hesretim
Hesreta tavên beharê
Ku dirakê best û lehiyan
Wî cihê têr ax û axên
Heya tu bê bes têr merez û şîniyan
Hêstir dibarin mîna ava kahniyan
Zarokên tazî
Dayikên têr kûl û derd
Xûşkên situ xwar
Ku na gihina mirada xwe
Tim bi xem û xemderd
Wan birayên birîndarê romiyan
Bi hesret im
Hesreta cih û war

9/
Bi hesret im
Hesreta deşta Wanê
Qeraxê golê
Naveroka Axirdemanê
Cihê Matran Îsa
Wî beranî wî xweş hogicî
Xwedî ol
Xwedî bextê mêranî

Bi hesret im
Bi hesreta penîrê mala Hacî Osman
Gundê Hoserê
Raserî Hezexê
Warê kevirê zemanî
Nemberî Newala Dojehê
Bi Necmedîn re
Serê sibehî nîska germ
Têr qalî û simak
Bi nanê tenûrê
Bi wan kevçiyên darî
Karê destên Ezîzê Xirbihî
Têr ked û rebenî
Ji darê gulê
Yan belalûkê
Dirrihên bê kûnêrî
Xas
Bi miqar hatî kolan
Bi kêr û kêrûn hatî mişandin
Hatî neqişandin
Bi hostenecariya salên kevnare
Hatî xemilandin
Bê tirsa roma reş
Têr xwaribane

Bi hesret im
Bi hesreta nava bexçên Derhavê
Ber Ava Mezin
Wan hinarên radîşo
Bi Kamûranê şeş telî re
Têra xwe metelok
Têra xwe mamik gotibaye
Gûhdariya dengê sitranek têr evîn
Bi dengê avê re kiriba ne
Hatibane gundê Mîzîzexê
Payîtexta Tora Hevêriya
Nava rez û werzan
Binê mêwên bûyî dêlî
Tejî weşiyên gulî-gulî
Zeynebî
Hesenî
Deywanî
Kerkûş û mezrone
Bilbizêk û gewre
Û reşê mîranî
Ber siha kokelê
Têr xwariba ne

10/
Bi hesret im
Bi hesreta wî welatî
Ew welatê min jê têr ne xwarî
ne vexwarî

Bi hesret im
Bi hesreta dengê kevoka ser hêlînê
Wê xumxum û hêviya evînî
Bi hesreta dengê şivanê pezî me
Horhora dengê gavanê Torê
Şorşora karwanê ser rêya Midyadê
Bi serê sibehî re
Ew bêrîvanê gotinê xwe
Li ber bayê hînik diberdin
Derdê dilê xwe di hildêrin
Dengê zarokan
Li ber agirê êvarî
Di nava lîstikêde
Tuştê
Bûk û çirrê
Bi jiyana ciwanik re
Ku dibê çîre-wîra wan

Bi hesret im

11/
Bi hesret im
Bi hesreta dengê berbûlî
Bi hesreta dengê xêlî
Di ber bûka ser hespê re
-Hevalê li te delalê
Narê sed car narê
Kinikê bisk bi çarê
Rakin dayika xalê
Hey bûkê li te delalê-

Bi hesret im
Hesreta civata mêran
Salifê bav û kalan
Wan şevên zivistanî
Lîstika hingulîskê
Têr henek û şahiya dilan

Bi hesret im
Hesreta welatê Kurdistan
Kurdistana azad
Wî welatê bi xwîna xortan
Bûyî bi xeml û hatî avdan

Bi hesreta tewafa kêlan
Ser gorna wan
Danîna kûlmek ax
Axa têr mircan
Heft baqê gulan

Wan şehîdên
Bûyî palê Şeşimstan

12/
Bi hesret im
Hesreta dengê kewên ribat
Rafê şêran
Wan beran û wan hogican
Ku dikin şer û ceng û xebat

Bi hesret im
Hesreta hevalên
Destûbirakê Kurdistan
Ew hevalên bi dengê bilûra Memê Şivan re
Di kevina nava bayê xerbî de
Digerin li nava gelî û mesîlan
Di deynin li serê çiyayên bi mij û moran
Xwe di berdine nava deşt û newalan
Nava pêlên Ava Mezin
Nava pêlên çemê Xabûrê
Wan pêlên heft rengî
Mîna xewasên pêlewan î dîrokî
Hêvî û daxavazên me tênin cî
Mîna Seydayê Gerhok
Cîhanê bi dengê bilûra xwe
Ji xewa bê xem şiyar dikin
Kesên xirayî ji deydîka wan dirakin
Bi horîna awaza xwe
Xem û kulan di revînîn
Ser dilê dayîk û jinan
Wan keseran di hilênin
Dibêjin her dibêjin
Dibêjin sitranên azadiyê
Dibêjin her dibêjin helbestên serbestiyê

Bi hesret im
Hesreta civat û şahiya dilê evîndar



Sal 1947, li hêla Torê, li gundê
Mizîzexê hatim cîhanê. Mamostayî
ya heft salan, heşt cara sirgunî
bi xwere anî. Û dadgeh!...
12 Adarê, li Amedê hatim girtin.
1973, li Stembolê bûme rojnamevan.
Weşanxana ABeCe jî vekir,
12 Êlunê hatim girtin. Heya 1987
domand... Zor û zehmetî û
perçiqandin nayê hed û hesêba.
Cih û war!... Roma reş mal û
mewdanê min pirr talan kir.
Qet ji hêviya serfiraziya gelê xwe
dûr ne ketim. Îro jî,
dijwariya min, mîna helbestê min
ji dil berdewam e.